

## Heqên Multecîyên Bikefilê Taybet

Tu bi xêr hatî Kenedayê! Eger tumultecîyekî bikefilê taybet ê li Kenedayê (ji xeynî Quebec-ê) dijî bî, ev mesder ji bo te ye. Eger tu li Quebec-ê dijî, ji kerema xwe ji bo zanyariyê-malûmatêbi *Immigration, Diversité et Inclusion*-ê re têkilî bike.

Maneya bikefilbûna taybet ew e ku komeka ji kesên li Kenedayê ji bo anîna we ya vê derê serî lê bidinû ji bo destekdayîna we soz jî bidin ku dê di nava zemanê kefaletê de mesrefên we yên esasî hilgirin ser milê xwe.

Ev mesder **heqênte û hîvîyên tu ji kefilan bikî** ji te re vedibêje. **Û ev herweha eger tugumanê ji kefîltiyê bikî an bawer bî desteka divê ku ji te re were dayîn nayê dayîn, tu ê çî bikî.**

### Kefîlên Taybet Çi ne?

Kefîlên taybet ew dilwaz in ku te divê tu bi rêya kefîltiya wan werî Kenedayê. Ew peydekirinapere û bicîhkirinê hilgirtine ser milê xwe. Dibe ku tu kefilan nas bikî, herweha ew dibin endamên malbata te yan hevalên te bin, an jî kefilên te dibin ku biyanîyên dixwazin alîkarîya te dikin ên tu ê wan di hîvên-mehên pêş de nas bikî bin.

### Fetreya Kefîltiyê Çi Qas Dirêj e?

Gelekê caran fetreya kefîltiyê **salek** e. Di rewşên gelek îstîsnaî de, eger berî tu werî Kenedayêji beşa **Immigration, Refugees and Citizenship Canada (IRCC)** yadewleta Kenedayêwere xwastin ku kefil dikare bêtirî salekê desteka kefîltiya bide, fetreya kefîltiyê dikare bêtirî salekê be. Eger fetreya kefîltiyê bêtirî salekê be, jixwe dê **IRCC** ji we re bêje.

### Divê Tu Ji Kefîlan Çi Bistînî?

**1) Desteka pereyî ya mesrefên esasî dixwe nava xwe, ji bo salekê yan heta tukaribîxwe bixwe îdare bikîye, her kîjan ji wan pêşî bê.**

Kefîlê te di saleka te ya pêşîn a di Kenedayê de ji destekdayîna te ya pereyî mesûl e, yan heta tu karibî xwe bixwe îdare bikî. Di nava destekê de dibe alîkarîya pereyî hebe, lê kefil dikare eşyayan, mefrûşatê, eşyayên navmalê û cil û kincan-çekan jî bide te.

Divê têr pere **yanev eşya** ji te re werin dayîn:

- a) Mal (odeyek, apartman yanxaniyê tu lê bijî)

- b) Xwarin
- c) Cil û berg-kinc-çek
- d) Çûn û hatina herêmî (wek nimûne; bas yan trênen gelî)

Eger di çarçoveya **Blended Visa Office-REFERRED (BVOR) Program**-ê de kefîltîya te hatibe kirin, dê Dewleta Kenedayê ji meha pêşîn a tu li Kenedayê yî pê de ji bo şeş mehanji bo mesrefên te yên esasî çekên bankeyê yên mehane bide te. Koma kefîltîya te ji van tiştan mesûl e:

- Peydekirina pere, yan eşyayên raxistina malê wek mefrûşatan, eşyayên metbexê, tiştên paqijiyê, livîn, hinek xwarin, pêşînatên kirêkirinê û xizmetan, hinek cil û berg-kinc-çek filan. Hin ji van eşyayan dikarin ji bo xêrê werin dayîn.
- Ji bo mesrefên esasî di **meha pêşîn** a tu li Kenedayê de pereyê têr yan eşya (li jorê hat binavkirin) ji te re werin dayîn.
- **Di seranserê pênc mehên paşîn** de ji bo hemû mesrefên te yên esasî (yên li jorê hatin binavkirin) yan eşyayan pereyê têr, yan jî heta tu karibî bixwe îdareya xwe yan ya malbata xwe bikî, kîjan pêşî bê.

Eger tu di seransera saleka di Kenedayê de karekî bibînî, dibe ku kefîlên te miqdarê pereyê didin te kêmtir bikin. Eger tu karibî xwe û malbata xwe *bi temamî* îdare bikî, koma kefîltîya te navê êdî hîç desteka pereyî bide te; qerarê li ser dewamkirin yan dewamnekirina desteka pereyî dimîne li ser wan. Tevlî vî awayî, eger tu di seransera dema kefîltiyê de bê kar bimînî, kefîlên te divên dîsa desteka pereyî bidin te. Bi awayekî sade, **koma kefîltiyê divê qenc zanibe ku tu di seransera kefîltiyê de hemû esasên di lîsteya jorî de pêk tînî**. Li ser dema destpêkirina karîawayê pîlanê ew ji te re bi hev bixin, dan û standinên bi koma kefîl re fikrekî baş e.

Eger ji bo mesrefên te û yên malbata te jixwe têr pereyêntê hebin, kefîlên taybet navên desteka pereyî bidin te. Eger te bi xwe re pere anîbe Kenedayê mumkin e ku koma kefîltiyê ji te bixwaze tu mesrefên xwe yên li Kenedayê bixwe bidî. Sponsor di encamê-netîceyê de ji qenczanîna têrkirina pereyê ji hemû îhtîyacên te yên esasî mesûl in.

Rindbûna mal û eşyayên tu bi dest bixî maye li ser miqdarê pereyê ku komê ji bo te xuyandiye. Her çend eşya û raxistana malê ya ji te re peydekirî luks nînbîn jî, divê ew têr bikin. Mala te divê têrî bicîhbûna hemûyê malbatê bike û divê ji bo kîrîna xwarinê têr pereyên te hebin da ku tu û malbata xwe xurt û saxlem bin.

Mumkin e ku pereyê ji te re werin dayînbêtirî yan kêmtirî yê multecîyên din be. Ji ber ku dibe tevî ku hinekkesên din miqdarê pereyê herî hindik ê lazim veqetînin jî, hin komên kefîltîyê ji bo kefîltîyê karibin bi miqdarê mezin pere veqetînin. Dibe ku ji ber hin komên kefîltîyê ji bo nûhatîyên bikefîl kirêkirina belaş yan eşyayên malê yê ji xêrxwazan standî û herweha her meh pereyê kêmtir bidin, dema ku komên kefîltîyê yê din pereyê bêtir û tiştên ji xêrxwazan peydekirî bêtir peyde bikin. Hemû kom cuda ne. **Bi kêmayî, ji kefîla hîvî ew e ku ew dereceya desteka wek nîrxê alîkarîya civatî ya li qezaya te peyde bikin û alîkarîya têr a ku mesrefên te yê esasî biqedîne, peyda bikin.** Herweha dibîranîna wî awayîmuhîm e kuji multecîyan re di sinifên cuda de (wek **Government Assisted Refugees**) bicîhkirinên cuda hene.

## 2) Di seranserê dema kefîltîyê de desteka bicîhkirinê

Kefîlên te divên ji bo avakirin û çêtirkirina jîyana te ya li Kenedayê alîkarîyê bikin. Di nava van tiştan de gelek tiştên ev jî tê de ne (lê sînorkirî nînin) hene:

- **Xanî**
  - Ji te re dîtina xanîyekî, yan alîkarîya ji bo peydekirina xanîyekî.
- **Rêbertî**
  - Hînkirina te ya çûn û hatina bi wesayîten gelî, wek bas û trênan.
  - Li hember civatê pêşkêşîya te, û alîkarîya dîtina markêta nêzîktirîn.
  - Vegotina qanûnên li Kenedayê.
- **Xwedîkirina ji bo Sişhetê**
  - Alîkarîya ji bo serîlêdana kerda sişhetê ya eyaletê **Interim Federal Health Program (IFHP)**
  - Ji we re dîtina hekîmekî, dirançêkerêkî, û xizmetên sişhetê yê din
  - Vegotina xizmetên sişhetê.
- **Hînbûn**
  - Alîkarîya ji bo qeyda li xwandingehên Îngilîzî û Frensî
  - Alîkarîya ji bo qeyda zarokan li xwandingehê.
- **Belge û xizmetên giring**
  - Alîkarîya ji bo vekirina hesabeka bankê, serîlêdana ji bo **Social Insurance Number (Jimara Dabînkirina Civatî)**, û eger zarokên te hebin, alîkarîya ji bo serîlêdana **Canada Child Benefit (Feydeya Zarokên Kenedayê)**.
- **Tercûmanîya devkî**

- Dema ku lazim bû, peydekirina mutercimekî devkî.
- **Peydekirina Karî**
  - Girêdana te bi xizmetên dîtina karî re.
- **Mesder û Xizmet**
  - Girêdana te bi mesder û xizmetên guncaw re, wek Settlement Worker (Bicîhkirina Karkerî). (Ji bo di herêma xwe de dîtina xizmetên kardîtinê, serî li vê derê bide:  
<http://www.cic.gc.ca/english/newcomers/map/services.asp>)

Herweha kefil divên **desteka hissî û exlaqî** bidin te da ku tu jîyana xwe ya li Kenedayê rind bikî.

### **Mesûlîyetên Te yê Bîcîhbûnê Çi Ne?**

Carek ku tu gîhîştî Kenedayê, hîvî ji te ew e ku tu di zemanê nêzîktirîn de ji bo têrkirina xwe-bixwe tiştê ji destê te tê bikî. Dibe di nava vî tiştî de tevlibûna te ya li xwandingehên Îngilîzî yan Frensî, têkilîkirina bi Settlement Worker (Bicîhkirina Karkerî) yeka ku ji bo di jîyana bicîhbûna li Kenedayê karibe alî te bike, û destpêkirina çavgerandina li karekî tu karibî bikî hebin. Digel ku li Kenedayê te navê tu di sala xwe ya pêşîn de ji bo desteka xwe û malbata xwe kar bikî jî, şîret li te tê kirin ku tu ji bo dewra piştî bidawîhatina kefîltiyê nîyeta pîlaneka desteka xwe-bixwe û malbata xwe bikî.

### **Eger Tu li Kenedayê Barkirina Bi Bajarekî Din ve Bibijêrî dê Çi Bibe?**

Tu nikarî li Kenedayê bar bikî bajarekî din. Tevlî vî awayî, eger tu barkirina bi perçeyekî din ê Kenedayê ve **bi dilê xwebijêrî**, dibe ku kefilên te nikaribin alîkarîya pereyî û bicîhkirinê bidin te. Ji bo nûhatiyên alîkarîya dewletê distînin: Dibe ku ji bo qismê mayî yê dewra kefîltiyê, ji **IRCC**-ê heqê te yê standina desteka pereyî nemîne.

Kefîlên taybet ên ku ew desteka te hilgirtine ser milên xwe, li ser esasê fehmkirina jîyana li civata xwe wê (destekê) dane. Digel ku li Kenedayê heqê te yê barkirinajî bo her cîhekî heye jî, kefilên taybet, bi tenê ji bo jîyana te ya li civata xwe ya ji bo sala pêşîn destekê didin te. Eger te bar kir, kefil divên di civata nû de ji bo te çavê xwe li kefilekî bigerînin. Tevlî vî awayî, eger ew nikaribin wi tiştî bikin, dibe ku tu êdî desteka kefîltiyê wernegirî.

### **Kefîl Nikarin Çi Bikin?**

Kefîlên te ji bo destekdayîna te li vê derê ne. Ew nikarin;

- **Berî tu gihîştî** ji bo kefîltîyê ji te tu pere bistînin, tevî her çi mesrefî, yan ji bo dayîna pereyê mesrefên te yê jîyanê yê li Kenedayê (digel ew bêjin ew ê li te vegeînin jî)
- Piştî tu gihîştî, ji bo kefîltîyê, bi şertê dîsa vegeîrandina li te be jî her çi pereyekî ji te bistînin (wek dibîranîn; dibe ku ji bo alîkarîya dayîna pereyê mesrefên te bixwe, pereyê te bi xwe re anîye ji te bipirsin)
- Xebitandina bi zorê
- Ji te bixwazin tu ji wan re belaş bixebitî
- Ew bixwazin her çi tiştêkî tu nikaribî bikî, bi zorê bi te bidin kirin.

Kefîl, bi dilxwazîya xwe çêtirkirina jîyana te ya li Kenedayê hilgirtine ser milên xwe, û nikarin hîvîya hîç tiştêkî ji bo lêvegeîrandinê bikin yan bixwazin.

### **Eger Tu ji Kefîlên Xwe Alîkarîya Têr Wernegirî Divê Tu Çi Bikî?**

Eger tu bawer bî ku kefîlên te yê taybet alîkarîya diyarkirî nadin te, eger tu rehet bî, endîşeyên (qelqên) xwe bi kefîlan bişêwîre. Eger ew kefîltîya ji te re bi rêya dezgehekê-(muesseseyekê) kiribin (wek nimûne **Sponsorship Agreement Holder**-ek), endîşeyên (qelqên) xwe bi dezgehê bişêwîre. Eger tu hê jî destekê nastîni, yan tu ditirsî nêzîkî kefîlan bibî, divê tu bi **Immigration Refugees and Citizenship Canada (IRCC)**-ê retêkilî bikî. Di têkilîkirina bi **IRCC**-ê de hîç giringîyek tune ye û dê tesîrê li ser awayê te yê Bicîhbûna Daîmîneke. Dê **IRCC**, ji bo helkirina teşqeleyê muhawele bike çareyekê bibîne.

Tu dikarî bi vî awayî bi **IRCC**-ê re têkilî bikî:

- Şandina e-maîlê; [PSR-PPPR@cic.gc.ca](mailto:PSR-PPPR@cic.gc.ca)
- Têlêfonkirina ji Navenda Têlêfona giştî ya **IRCC**-ê re ji 1-888-242-2100ê.

Di netîceyê de, dê mektebeya **IRCC**-ê ya Mintiqeyê bi we re têkilî bike (mektebeya **IRCC**-ê ya ku bi pirranî li mintiqeya te cîhgirtî ye).

Mektebeya **IRCC**-ê ya mintiqeyê, dê li ser rewşê ji te pirsan bike, û dibe ku herweya bi koma te ya kefîltîyê re jî biaxîfe. Ew ê muhawele bikin malumatên te dayî yê wek alîkarîya pereyî û bicîhbûnê û sebebên têr feydenedîtina te ya ji destekê berhev bikin. Dema ku ew vê lêkolînê dikin, eger mektebeya **IRCC**-ê ya Minteqeyê qerar bide ku îhtîyacê te bi alîkarîya pereyî ya bilez heye, dibe ew karibin ji bo te hin budceyên bilez peyde bikin. Mektebeya **IRCC**-ê ya mintiqeyê herweha dê li ser kesê alîkarîya pereyî û bicîhbûnê pêşkêşî te bike, qerarê paşî bide. Eger ew qerar bidin tu desteka têr nastîni,

û koma kefîltîya te êdî nikare yan naxwaze desteka bêtir bide te, ew dikarin “**sponsorship breakdown**” (**îbtalkirina kefîltîyê**) beyan bikin. Maneya vê ew e ku koma kefîltîya te êdî di dewreya kefîltîyê ya mayî de naxwaze ji desteka te ya pereyî û bîcîhbûnê mesul be. Di vî şertî de, dibe ku ji bo te;

- Ji bo kefîltîyê komeka din were xuyandin, an
- Budceyeka dewletê were dayîn, an
- Were gotin ku tu dikarî serî li alîkarîya civatî ya herêmî bidî.

Li gora rewşa bûyerê, dibe ku ji bo koma kefîltîyê hin netîce hebin. Wek nimûne; dibe ku ew pereyê budceya dewletê yan alîkarîya civatî ya herêmê ya tu bi dest dixî, li dewletê vegehin.

Bibîranîna vî tiştî giring e ku çareûencamênli ser bûyerekê û bûyereka din xuyandîdimîne ser IRCC-ê.

### **Eger tu Şaş Werî Bikaranîn, Werî Îstîxlalkirin yan Werî Bikaranîn divê tu çi bikî?**

Eger tu bawer bî tu ji alîyê kefîlên xwe ve şaş tê bikaranîn an îstîxlal dibî, ji kerema xwe zû-zûka ji [PSR-PPPR@cic.gc.ca](mailto:PSR-PPPR@cic.gc.ca) bi **IRCC**-ê re têkilî bike. Gelek nimûneyên şaşbikarhatinê û îstîxlalkirinê hene, hin ji wan ev in:

- Tehdîdbûyîn,
- Ji kefîlî re mecbûrmayîna dayîna pere,
- Nehîştina derketina ji xanî;
- Xebata bi zorê;
- Bi zorê xwastina kirina bi tiştên ji bo te ne guncaw.

Ji bo her çi bûyerên ciddî û bilez, bi polêsî re têkilî bike. Eger ew bilez be, ji bo alîkarîyê zû-zûka li 911ê bide. Di nava bûyerên bilez de ev hene (lê bi tenê ev nînin):

- Eger hinek zîrarê didin te yan malbata te,
- Eger tu ditirsî ku hinek zîrarê bidin te yan malbata te,
- Eger sûcek li ser te tê pêkanîn, wek yê fizîkî yan cînsî.

### **Eger tu Endîşeyên (qelqên) xwe Bigihîni **IRCC**-ê dê Çi Bi te Bibe?**

Eger tuji ber ku ji kefîlan desteka pereyî û ya bîcîhbûnê têr nastîni, yan endîşeyên te li ser sponsorîyê hene; tevî tu bawer î ku îstîxlal an xerabî li ser te pêk tê, tu ji **IRCC**-ê alîkarîyê bixwazîhîç **encamên** wê ji bo te tune ne.

Eger tu endîşeyên xwe jî **IRCC**-ê re bêjî, ji bo te hîç xetereka jidestdayîna awayî Bicîhbûna Daîmî ya li Kenedayê tune ye. Dê rewşa te her wek xwe bimîne, û **IRCC** dê tê bikoşe jî bo ku teşqeleya tu rû bi rû mayî çareser bike.

## Heqên Te Çi Ne?

Heqê te heye tu her çi endîşeyên (qelqên) xwe ji koma xwe ya kefîltîyê re bibêjî. Wek nimûne, eger her çi endîşeyên te, li ser bêyî qebûlkirina te belavkirina malûmat û fotografên te, yan li ser navê te dayîna qerarên hebin, heqê te heye tu endîşeyên (qelqên) xwe bigihîni kefilên xwe.

Herweha heqê te heye tu alîkarîya pereyî û bicîhbûnê ya li jorê dîyarkirî ji kefilên xwe bixwazî.

Heqê te heye tu ji bo gihandina endîşeyên xwe yê nî mumkin be hebin, bi **IRCC**-ê re têkilî bikî, û eger lazîm be bi polês re têkilî bikî.

## Tu Dikarî Zanyarîyê-Malûmatê Ji Ku Derê Peyde Bikî?

Ji bo zanyarîya bêtir, ji kerema xwe bi vê derê re têkilî bike: **Refugee Sponsorship Training Program (Bernameya Hînkirina Kefîltîya Multecîyan): (RSTP)**

Têl: 1-877-290-1701

E-mail: [info@rstp.ca](mailto:info@rstp.ca)

Faks: 416-290-1710

Întêrnet: [www.rstp.ca](http://www.rstp.ca)

Eger tu li Torontoyê bî, tu dikarî ji vê jimarê re têlefôn bikî: 416-290-1700, hundirî 404 yan e-mail [torontorss@rstp.ca](mailto:torontorss@rstp.ca).

© 2016, **Catholic Crosscultural Services** û **Refugee Sponsorship Training Program**. Ev belge bi mafê çapê hatiye parastin û bi mebesta bikaranîna bidestûr e. Eger destûra te tune be û bixwazî vî tiştî bi tevahî yan perçe perçe bi kar bîni, ji kerema xwe bi me re têkilî bike: [resources@rstp.ca](mailto:resources@rstp.ca).